

Agadarî ji kesên ku ji wan re hatiye gotin ku li karantîne yan tecrîdê ji malê de bimînin

Piraniya kesên ku tûşî nexweşîya korona (COVID-19) bûne bi tenê tûşî nîşanên sivik dibin, lê hin kes bi giranî nexweş dibin. Ji ber vê yekê, em dixebitin ku li seranserî welêt rêjeya belavbûn û enfeksiyonê kêmtir bikin. Ji hinek kesan jî aliyê doktorên wan re tê pêşniyar kirin ku li malê bimînin.

- Kesên ku nexweşîya koronar an COVID-19 ya wan hatiye tespît kirin, divê bi tevahî ji kesên din bêne dûr xistin û bi şêwaza "tenê mayin/veqetîna l malê" di malê de bêne ragirtin.
- Kesên ku nexweşîya korona yan COVID-19 ya wan nehatiye tespît kirin, lê di bin metirsiya enfeksiyonê da ne, dibe di rewşa bi navê "karantîneya" de werin ragirtin.
- Herwisa kesên ku ji welatên din têne Norwêcê dibe di karantîneyê da bimînin.

"Tenê mayin/veqetîna l malê" tê çi wateyê?

Eger bijîjkekî ji we re gotiye ku hûn bi tûşî vîrûsa korona an COVID-19 ê bûne, an li benda encamên testa xwe ne, hûn jî bo ku pêşî ji belavbûna enfeksiyona koronayê ji kesên din re bigirin, pêwîst e ku dev ji têkiliya bi kesên din re bigirin.

Tenê mayin/veqetîna l malê tê vê wateyê ku divê hûn xwe jî hemî kesên din re, di nav de yê ku bi we re dijîn, jî hev veqetin. Nabe hûn li derveyî malê rêwîtiyê bikin. Pêdivî ye ku hûn di odeya xwe de tenê bimînin û bi tenê bixwin û dev ji bikaranîna hevparî ya xewlî û destmalê berdin.

Eger rewşa we xirab dibe, bi doktorekî re bi telefona 116 117 di têkiliyê de bin. Gengaze ku doktorê we jî biryarê bide ku hûn di nexweşxaneyê de bi tenê bêne ragirtin. Tenê mayin yan veqetîna we demekê bi dawî dibe ku doktor jî we re bibêje ku hûn jî rîska nexweşîya koronayê xilas bûne, an ku encamên teste we destnîşan bike ku hûn êdî tûşî êşa koronayê an COVID-19 ê nînin.

'Karantîne' tê çi wateyê?

Eger doktorek jî we re bêje ku hûn nenexweş in, lê di bin rîska enfeksiyona koronayê de ne, divê hûn xwe di rewşa karantîneyê de ragirin. Eger hûn jî welatên din bêne Norwêcê, her ew rewşe li ser we tê sepnadin. Hûn neçar in ku li malê yan cihek din ku kêrhatî be bimînin, lê karantîneya li malê, li gorî tecrîda li malê sînor û astengiyên kêmtir hene.

Karantîne tê vê wateyê ku divê hûn têkiliya xwe bi kesên din re bi qasî ku pêkane kêmtir bikin, lê ne hewce ye ku hûn bi tevahî veqetandin an vekişandinê bikin. Pêdivî ye ku hûn

Opprettet: 03/2020 Oppdatert: 16.06.20

neçin malê û dibistanê, nabe çalakiyên din jî bidomînin, nabe hûn bi alavên veguhestina gelemperî (otobûs, trêna, metro, firoke an gemiyê) rêwîtiyê bikin lê hûn dikarin b tenê rêwîtiyê bikin.

Eger hûn tûşî kuxînên domdar, enfeksiyon an êşa qirikê, tayê an bêtengiyê an jî astengiya di bên kişandinê de ne, girînge ku bi hejmeta telefona 116 117 bi bijîşkekê re bi têkiliyê bikin. Testa COVID-19 ê li Norwêcê belaş e.

Karantîne ji bo 10 rojan piştî ku hûn ketin nava Norwêcê yan cara dawî ku hûn ketin ber metirsiya enfeksiyonê, tê berdewam bibe.

Hişyar bimînin!

Hikûmeta Norwêcê daxwaz li hemû mirovan dike ku agahî û pêşniyarên ku li ser malpera at www.fhi.no û www.helsenorge.no bixwînin. Ev pêşniyar gengaze ku biguherin. Agadarî bi zimanên Norwêcî û Ingilîzî jî berdest in. Eger di fêmkirina her babetekê de hûn tûşî pirsgerêkê ne, ji kerema xwe ji kesek kêhatî alîkarî an destekê bixwazin.